

Bobelat li benda me ye!

Ez ji zû de bitirs im li ser rewşa Başûrê Kurdistanê, jiberku welat ne bi wan awayina bi rê ve tên birin, çawa li wir dibe. Hêvî û xebatên dilsozên kurdsitanî hemî ew bûn û ewê timanî mayîn be jî, ku ew bê parastin, pêşda biçe, bibe nimûneyeke yektayîye dostanî, biratî, xwîşkatî û wekhevîyê di navçeya kavil de.

Hêvîya me hemîyan ew bû û ewê timanî mayîn be jî, ku berjewendîya gelê kurd û Kurdistanê – ji xwe em bê hev ne kes in - di radeya tevî serekîn de be, ew di ser her kesayetî, her rêxistin û partîyekê re be, lewma em zanin, ku çiqas jandar e mera bê pênase û bê welatekî serbixwe be.

Lê mixabin hemî dîyarde û bûyer nimadikin di van du hefteyên pêşin de ji îlona 2016an, ku hin dekûdolabên ji zû de hatine amadekirin bere bere dipuşkuvin û bîhna jehrê jê tên.

Ez tu geşbînîyê – mixabin – bo diwarojeke şayiste bo qehremantîya gelê kurd, bona ewqas cangorî, xwînrijandin û kavilkirinê nabînim, jiberku berpirs û rêxistinên kurdan ên xwedî hêz û deselatdar hindava bizava serbestîya kurdan berv tarîti û koletîyê dibin, wê ispardeyî dagîrkerên faris, tirk û ereb dikin.

Kurdino! Berpirsyarino! Hîn bîyav heye, bila Kurdistan netê firotin!

16.09.2016

Dr. Husên Hebeş

E.Mail: husseinhabasch@gmx.de